

# Estêre

Zimanê berî Eñşûîrûş Paşai da ewê desthelata wî ji Hindê fieta Koş, gehişti 127 herêm keftine dest paşai. Rojekê ji jina xu gelek turre bî u jina xu ber da. Belê piştî hingê turrebîna wî hate temirandin u bê kes ma u jinek di divîa.

Zelamekê Cihî, navê wî Murdexai, bî. Eve hat bî êxisîr kirin ji Urşelîmê digel kumek êxsîra di ewêt nebuxiz nasirê paşae Babil êxsîr kirin. Eve Cihî çavdêria kiça mamê xu Estêre kir çunku Estêre sêwî bî. Ev kiçe gelek cuan u hêja bî, u Murdexai xudan kir bî demê deyk u babê wê mirin. Ji ber fermana Eñşûîrûş Paşai, Estêre birne qesira paşai. Estêre binîatê xu bu kesê ne digut çunku Murdexai gut bîn.

Paşai dilê wî gelek kefte Estêre pitir ji hemî jinka. Herwesa pê razî bî u tanca paşatiê dana di ser serê wê u bî jina wî.



ji laê Gulzar Salih 2005

Piştî hingê Eñşûîrûş Paşai qedir u qîmetê zelamekê (navê wî Hamanê) bilindtir u zêdetir lê kir ji hemî heval u hugirê wî ji seruka pitir lê hat. U bi fermana paşai li nav beyna zelamê paşai ewêt li ber dergehê paşai dirawestan sucde bu Hamanî dibirin li dîv fermana paşai. Belê Murdexai qebîl ne kir sucde bu Hamanî bit yan xu bu bişkênit. U Hamanê gelek ji wî turre bî. Demê agehdar bu wî ku Murdexai Cihî ye ji xu ne girt sizaî biditê birîar da ku nîfşê Cihîya ne hêlêt betaybet ew Cihîet dibin paşayeti ya Eñşûîrûş da xu cih. Hamanî gute Eñşûîrûş Paşai, “Milletekê hey dinav paşayeti ya te da belav desturê wan wek desturê hîç milletekê di nîne u ew fermanêt

paşai bi cih nînin çenabit paşai kirbar u bu çûna wan ji hizira xu bibit. Heker paşai pê xuş bit, fermanekê derbêxit bi nehêlana wan yan ji binbirna wan u ez dê deh hizar wezinêt zîvî bu xizîna paşayetiê pêşkêş kim ji bu binbirna wan.” U paşai gute Hamanî, “Ezê zîvî u milletî deme te. Hema herre tu çi li wan dikî bu te hêlal e.”

Murdexai perekê fermana paşai virêkir Estêre u divîa beramber paşai hîazar bibit u hîvîa ji paşai bikit belku vê birîara nehêlana Cihîya vekêşit u li wan biburit. Gute wê, “Heker te xu bê deng kir di vî wextî da, keyf u rizgar bîn bu Cihîya dê ji layekê di ve êt. Belku tu u mala babê te dê bin birbin. Kî dizanî belku tu ya gehişti ye textê paşai bu demekê husa.”

Estêre gute wî, “Berdewam be Cihîya bike: Rojîa ji ber min bigirin, ne xwin ne vexwin di sê roja da bi şev u roj. Ezê weku we dê sê roja digel xizmetkarê xu bi rojî bim. Paşî ez dê çime nik paşai ser u jêr ji terzêt pê kirî, u heker ez mirim, ji xu eve ez mirim.” U Murdexai rabî çû ka Estêre çi gutîê wesa reftar kir.

Li Roja sê Estêre cilkê paşayetiê li bejina xu kir u çû li hola paşai. Demê dîtî paşai şîşka zêrî drêj kire wê. Pirsîara wê kir gutê, “Te çi ye u te çi divêt? Her şulekî te hebit dê bi cih êt heker bi xu nîva paşayeti bit.” Estêre bersiv da, “Heker paşai xuş bit, evru tu digel Hamanî werin min xwarinek ya dirist kirî bu we.” Paşai gut, “Lez bikin herrin bêjine Hamanî da bête xwaringeha Estêre amade bit bi vî rengî.” Paşa u Haman her dû çûn li ser xwarina Estêre amade bîn. Piştî xwarîn, Estêre careka di mêhvan kirin bu

roja bêt u gute mêrê xu dê paşî xastina xu bu paşî bêjite wî.

Paşa u Haman her dû li mêhvandarî ya Estêre Xanim amade bîn. Demê wan mey vedixwarin, paşai pirsîara wê şajin, “Te çi divîa ji min ya tu hêz bîkî dê bu te bi cih êt? Pirsîara te çi bî heker nîva paşayetiê vegirit daxwazî ya te hêştê kême?” Bersiva da u gutê, “Heker te ez bivêm u li nik te bi biha, heker paşai xuş bit ya min divêt tu jîana min parêzî! Herwesa ya min divêt tu milletê min rizgar bikî çunku ez u milletê xu emêt hatîne ber hêlan u kuştin u nehêlanê. Heker em weku xulama u carî ya hat ban, heker wana weku xulama u carî ya di u pepîka ez da mit kim. Min ne diaxift, çunku ev birîare nabite egerek bu turrebîna paşai.” Eñşûîrûş gute Estêre Xanim, “Ew kî ye wêrîaî evî karî encam bigehînit? Ew li kîve ye?” Estêre Xanim bersiv da u gut, “Ew neyar u dijmîne Haman e!!” Paşai rabî ji vexwarin u bi turre bî gut, “Hamanî şeneq bikin.” U bi Hamanî hate şeneq kirin.

Her duê rojê da Paşa Eñşûîrûş xanê Hamanî dijmîne Cihîya kire xelat bu Estêre Xanim. Murdexai amade bî beramber paşai çunku Estêre Xanimê gut bî paşa ku Murdexai miruvê wê ye. Paşai gustîra tîla xu bi Murdexai bexşîş kir. Gute Murdexai, “Min divêt tu serperştîa kar u barê hebî yê Hamanî bikî.”

Piştî hingê paşai ferman da u namayek nivîsî, u hêla Cihî harî karîa êk u dû bikin da xu biparêzin dijî dijmînet xu.

U ji ber hindê Estêre Xanim xu u milletê xu ji mîrnê qurtal kir.